

Kiriyariya Roja Nû: ji bona erdên Sûriye û Libnanê, 35 Hreyên Sûrî; ji bona welatên din 5 Hreyên inglîzî. Bihayê Hejmarekê; 25 Qemerî.

ROJA NÛ

XWEDÎ Û GERÎNENDE: MÎR DR. KAMIRAN ALÎ BEDIR-XAN

Dîwan û gerîndekariya Rojname: Bêrût-Birc: Weqîf Tabet, Telefona Dîwanê: 74 04; Telefona Mala Xwediyê Roja Nû: 84-41. Edresa telg: Bêrût-Rojanû.

Civanê Sê Mezînan

Civanên sê mezînan, yê serekcîmhûrê Emerîkayê Truman, Serekwezîrê Brîtanî Çorçîl û Mareşal Stalîn, li Potsdamê, der nîzîngî Berlîne destpê kirine. Îro, ji bona hemî mîletên Cihanê, bûyera hejartir ev civan e; ji xwe têtê gotin ko pê deriyê dîwana silh û aştîya dinyayê, dê vebe. Tête gotin ko di vê pêvokê de, pîrsên jêrîn bêgîk bikevin axaftinê: gerandina germanîstanê û karên di wê bi tevayî, pîrsa Belqana, pîrsa welatên rohelatê nîzîng û navîn, pîrsa Sovyet û tirkî, pîrsa şerê japonayê, ya pesîfîkê û pîrsa bixwedtkirina Ewropayê.

SAN FRANSISKO

Nîmînendegên pêncî mîletan, neh heftan, di San Fransîskoyê de xebitîne.

Armanca wan a mezînan yek bû: heqê hemî nijadên dinyayê divê bêne nas kirin, biçûk û mezînan tevda; û bi vî awayî, divê mîletê êdî, şerî hev û du ne kin û êdî pîrsên sivîk û giran, ne bi zorê, ne bi çek û xwîn; lê bi axaftin, bi mijûlahî, bi gencî û heke hewce bû bi hikmê mehkemeke navnîjadî; bi destê mehkemeke ko ji lebatên mîletan hevedu dani ye, bête safî kirin.

Herwekî dîrok şantî me dîde, di wextên berî da, mirovan heqê xwe, dema hewcedariyê de bi zorê û bi destê xwe distandin.

Hakim û mehkeme tu ne bû.

Lê hêdî, hêdî mîletên cihanê pêş ve ketine, di xwendegah û zanîngehan de, hîmî rastî û nerastîyê; heq û neheqîyê; edalet û zorkerîyê bîne, û sehkirine ko zor ne tişteki bikêrhatî ye, dawîya zorê nîne; divê mirov li ser rîya heq û rastbûnê bimeşe û her kes bi heqê xwe qail bibe û ji bona bi cih anîne van qeydeyan, destekê divêtin, rabûn hakim û mehkeme danîn û ji bona peyayên dilrêş ko qîma xwe bi hikmê mehkemeyan ne dînan, û di zorkerîyê de, pêdîdanê erdê polîs û cendîrme nivîsandin.

Îro, gava ez ji kesekî dawa tişteki dikim; diçim balê; an peyayekî dişînim cem wî, an ew bi xwe lê cem min, û em bi axaftin û mijûlahî dikin dawa xwe safî bikin, an bi navçîtiya, mezînekî.

Heke wîlo çênebî, û em li hev ne hatin, ez radîbim, diçim mehkemê û di pêşiya hakimên mîlet de, heqê xwe jê dîxwazim.

Heke dawa min ne heqe, ez ji mehkemê destvala derdikevim; no, heke heq bi mi re ye, ez digehim heqê xwe.

Heger peyayê ko li gora hikmê hakimînan divê tişteki bidî min, ne da, polîs û cendîrme, bi emrê mehkemê, vî tiştî bi zorê jê distînin û didin min.

Bi vî awayî, lê ko emê peşînan, an li hev û du xînan, an hev û du brîndarî bikin, an bikujînan, dawa me safî dibe. Îro ko em pê elimîne; ecêbmayî dimînin ko kal û kalcîkên me wîto ne dikirin; û carna ji bona tişteki biçûk hev û du dikujînan û pîrcar dîjîmînalî dikel nabîra çêlîyên da malbatan, û wan bi salan ve, xirabîtiya hev û du dikin; û carina jî, ji bona tişteki sivîk eşîrekê dibê da bir û qayîş û berberîya hev dikirin.

Her çend jî mirova, ev çend hezar sal in, ev rastî seh kirine; di nav bîra mîletan de, gava nexweşîyêk an nesehkirînekê çêdibê; hakim û mehkeme tu ne bû ko, bikeve nav wan û wan li gora qeydeyên heq û edaletê bimeşîne.

Carina xwedî heq, bi dara zorê digîha heqê xwe û carna jî, bi zor û zê xwedî heq, heqşekandî dibê, welatê mîletekî an yê mîletên bêdûş dîhatin vegirtin, mîletên aza dîketin bîndestîyê; di lepê zalîman de, dîhatin êşandin.

Işê mîletan ev çend hezar sal in, wîlo bû. Piştî şerê 1914-1918-an, mîletên Hevalbendê, xwestî bûn, Zîlm û zorkerîyê ji erdê rakin; tişteki mîna cîval û mehkeme çêkirin û xebateke zor xebitîn da ko mîletê êdî şerî hev û du ne kin.

Lê di destê vî cîval û mehkemê de, polîs û cendîrme tu ne bû, û gava hikmêk dîda, yê ko jê nexweş dibân, vî hikmê dîstêtin piştî gahê xwe.

Şerînameya Mîletên Hevalbend, ya ko niho di San Fransîskoyê de, bi tevkariya pêncî mîletan hatîge danîn; bi polîs û cendîrme ye; gava di nav mîletan de, li ser pîrsekê nelîhevî hatînek çêbû, an dawayek hatîge rakirin; divê bi axaftin, bi mijûlahî, bi çeyî û gencî û heke çênebû bi qerara mehkeme mîletan, bête safî kirin. Heke dewletek qîma xwe bi van bîngehan ne anî, û dest avêtî şerê xwe, mîletên cihanê ên mayînan, rîya wî dibîrin, û zora wî bibînin.

Serekcîmhûrê Emerîkayê M. Truman gotîye: heke di dest me de asasê wîlo hebîwa, ev şer çêdîbû û bi milyonan insan— di vî şerî de 25 milyon peya hatîne kuştin — ne dîketin aza mirîne; û heke me xweş bala xwe ne da, bîngêbe nû danî; divê emê bizanin ko ji nû ve dikare şerê çêbibe û pê milyonan insan dikarin bêne kuştin.

Ma tu şîkî lêde heye?

Rengê Kevnare Me navê

Ey welat, em tev li kar in, bendî fermana te ne Rêncberê axa welêt in, lê ne ebd û kole ne Em hemî yekdest bîra ne, lîdî kurd navê sitem Serbîlînd em dê bîjîn, tev şah û gavan dem bi dem Ger ne jîn em tev wekî hev, serxwe na bî ey welat Rengê kevnare me navê, me divê jîn û felat Ma tu zanî, em çîma her dem bi hawar û eman Tazî û birçî dînalîn, kurd divêtin kînc û nan. Çol û deşt û lat û şaxên te hemî mist in ji zêr Zorkera ev tev revandin, mane em bê xêr û bêr. Wa şîyar bûne kurên te, tev li kar in, wek pîling, Çar kenarên te dibazin, wek Cegerxwîn qîr û deng.

Derdê Min-Derdê te

Şêxê min, destê te êdî, maçî nakim ez besê, Kavîl û wêran te hiştin, ev serê û medrese; gêxê Ewropa bi xwendin, wane baz in, bîrne jor Em bi xîşt û def û dîlan, paşketin, tev mane korî Her keqakî deh zimana zanî, rengê Eflêtûn Em çîma hov û nezan in, ser di berde paşveçûn. Qet bi şfwa te dijîmînan paşve naçin gavekî Bo çî tev mane perîşan, dîl û bendê davekê. Xortê kurda tev şîyar bûne bi pêta agirî Bayê zanîne li pey wî, gur dibî qet namîrî Dev jî payê tu berde ev tîralî ma çî yel Ma ne germ e, rût û xas e, kurd e, jar û birçîye Bes di bin perdê de rûnê, ey cîwanmêr xwe bînasî Dijîmîne jîna welêt î, tim bi dest te tev û das Lê bibêjîm, dê bibêjî, ev Cegerxwîn gawîr e No, di bextê te û Xwedê de, dil bi pêt û agir el Ez dîzanîm, min dirêj kir, pir li te peyv û kelam Ger tu kurd û kurdperestî, em bîra ne, wesselam.

Cegerxwîn

ME BIHISTIYE

— Par, karxaneyên amerîkî jî welatên biyanî re, ji bona 100 milyon dolar derman fîrotîne.

— Şerê Filipînê gîhayê dawîya xwe û 7000 giravên di wê jî japonayê hatîne paqîj kirin. Rûniştîmanên van giravan 17 milyon in.

— Refên amerîkî 26 bajar û şarîstanên japonayê he ta niha dane ber bomban. Karxane, destgeh, bender û depoxaneyên japonî derbine dijwar xwarîne. Niho bom-beavêjên amerîkî rast bi rast dirêjî balafirgehên erdê Tokyoyê; payetextê japonayê dikin. Di van rojan de, şeş balafirgeh bi awakî xurt hatîne bombardîman kirin.

— Mezînenê elemana yê ko jî vî şerê xedar berpîrsîyar in; mîna Goring, Donitz, Kaytel, Ribentrop, pêşiya mehkemeke eskerî a navnîjadî de, cîhaba kar û emelên xwe bidin û dê bêne êşandin. Ji bona danîna mehkemeke wîlo, Brîtanîya Mezînan, Frense, Sovyetîstan û Emerîkayê dest bi xebatê kirîne.

— Karxaneyên amerîkî jî bona şerê japonayê 160 milyon bombeyên şewat û teqandîne çêdîkin.

— Karxaneyên brîtanî di nav donzde mehên ko pêşiya me de ne, 250.000 otomobîla çêkin.

— Divê ez bikarîm serbest baxêvim; li ser tiştên ko dîzanîm fikra xwe bê tîrs bibêjîm, heke min dil kir herîm neçîrê an masîvaniyê; divê ez û birayê min û hemî wela-tîyên min jî rastîyê hez bikin.

Me dît dawîya zor û zorkerîyê nîne; yê ko bi dara zorê dîxwaze heqê xelkê bîşkinîne; dawî perîşan û şerpeze dibe. Hitler di pêşiya me de ye.

— Wîlo dixuye ko pîrsa Polonî ketîye rê û hikumeta polonî a nû, ji aliyê Brîtanîya Mezînan û Emerîkayê jî ve, hatiye nas kirin.

— 33 milyon jin û mêrên brîtanî tîkilî bîjartîna lebatên Cîvatmîletê Brîtanî ê nû bûne.

— Şerê Pesîfîkê de, he ta îro 600 hezar japonî hatîne kuştin.

— Di nav bîra Sovyetîstan û Tirkîyayê de, li ser lihevhatînekê axaftin çêdibe; ûris berî her tiştî Qers û Erdehan û di Çenek-Qoleyê de, ji xwe re cîhekî ewle dîxwazî.


Wêne



Leşkerên Ordîya Çardegemînê di Burmayê de. Herwekî baranê xurt dibarin, pêşveçûna tîgan zehmet e. Lê mirovên heja her tiştî pêk tînin. Tangek ji rê ketî, lête derêxistin.



Serbendên çînî yê Ordîya yekemîn ketîne bajarê Rangûn: xelk bi şabûnî bi wan re dîmeşî.



Serfermandarê qîwetî Hevalbend, an ên hejê; li Asya nîro-rohelatî bi serbendên bîlîndpaye daxêve. General Sir Oliver Lîs, bi lekên xwe ên egî Burma Nîroyî, jî japonayê paqîj kirîye.



Zaroyan divê berî her tiştî, hîmî xwendînan û nivîsandînan zimane xwe bînin.

Di gîrtîgeha Pîlsenê de, da sed zara baxwazî ji perîşan ma bûn. Gerîndekariya brîtanî ji bona wan xwendegahê vekirîye; lêde dot û law hîmî zimane xwe ê elemanî dîbin.

Çiroka Kurdi

Q E M E R Z E M A N

4

Şer hat cem wan rûnişt.

Hût jê re got: çima tu hatiyê vê derê, çavê te li çiyê?

Şer jê re got: ez û xweha xwe saetekê nikarin ji cem hev du ferq bibin, ez hêvi dikim ji xwedê û ji te, destûra xweha min bidî, emê herin. Hût jê re got: kengê tu çû, keçka mirê cinan. Ji roin re anî, ezê destûra xweha te bidim, an ko ne wilo be, destûr tune.

Şer jê re got: Bajare mirê cinan, li ki de rê ye? Hût lê vegerand go:

Ma mi zanî biwa, minê ji xwe re biantna... çi hewceyê te bû.

Şer rabû, li hespa xwe siwar bû, û bi dinyayê ket. Carekê li pêşiya xwe nerî ko toz û xubar billind bûye, nêzikî wan bû, nerî ko mirovekî dirêj û yekî kinik, ê kinik gazek beye, ê dirêj deh gaz hene; her du li hev du dixnin. Ê dirêj wê rahêje ê kinik, li ser serê xwe hilgîve û li erdê xîne; ê kinik li ser lingê xwe diedile.

Ê kinik jê re got: xwezî ez gazekî dî ji dirêj bûma, te ê bidîna, bê minê çi b'kirina ji te.

Şer li pişt vana sekiniye, ji xwe ra li vana diferice û got: arîkariya ê kinik ferz e, şûrê xwe kîşand û çû ê dirêj, serê wî jêkir, ê kinik go: mala te ave, ev mirê cinê şeytanî ye, ez mirê cinê rehmanî me.

Şer siwar bû li hespê xwe û ê kinik li ber xwe danî, ê kinik jê re got: te qencik mezin bi mi kir, ezê bi çi hewayî, qenciya te vegerînim; lazim tu bi mi re bê mala me,

Şer jê re got: ser çawa, meşyan bi hev re, çûn bajarê wan, ehlê bajarê wîna, pêrî wan re hatin, gelkî jê dilxweş bûn û çûn malê hevalbendê mirê cîna şeytanî hemî kîşandin ji xwe re anîn, bajarê xwe saff kirin.

Meclisa mirê evarê geriya û gotin ji hev re, emê emê, çi qenciye bi vî xortî bikin.

Hemua ji mirê xwe re got: lazim tu qîza xwe bidî vî xortê defal.

Mirê wan ji wan re got: serçava qîza min jê re ye, qîza min bitenê ne bese, divê em tişteki dî bidîniyê.

Şer lê vegerand go: malê min heye, ez ne mûtaacî tişteki me, te keçka xwe da min, min qebûl kir, mehra keçka xwe birîn û xistin odakê, dinya bû êvar, ji şer re gotin: here cem jina xwe razê.

Şer çû Oda keçikê, keçik ji ber rabû, şer bê ma'd bû. û di cihê xwe de rûnişt, keçikê jê re got: çima tu bê ma'dî, ma'dê te ne xwes e; te ez navem, an tu poşman bûyî? Şer jê re got:

Bi xwedê ez ne poşman im, belê ez ji te re bi rastî bêjim. Mesela xwe, hemû jê re got; go:

tu ne ji mi ra yî, ji Hût re yî, filan şkeftê de ye. Keçikê jê re got: mala te ave be, tîrsa Hûtê wê şkeftê di dilê te de ye? Iş, îşê wî li cem min e. Sibehê ezê bikim ko ew bişewite.

Were îşev rakeve, dilê xwe xweş bike, heya sibehê, Xwedê mezin e.

Sibehê her du rabûn, keçikê jê re got: here cem bavê min...

Lawik biya wê kir û jê re got: ezê herim cem bavê te, jê re çi bêjim.

Keçikê jê re got; tu ê jê re bêji, sicadek wîna hene, û xîzeranek heye, jê re bê ka bide min, şer bi ya wê na kir çû cem mirê cîna.

Mirê cîna gote wî: lawê min çi îşê te heye, got: ez dixwazim tu izna min bidî ezê herim welatê xwe. got: ev qencik mezin bi me kir, û me xelesa wê qenciya te, me dernexistiye hê... bi-xwaze bê te çi divê.

go: bêje tişteki dî jî, ezê bidime te.

go: besê mirê min, ma min çi qenci bi te kiriyê, mi divê ez qenciya xwe nas bikim.

Mirê cîna jê re got: ewê mirê cîna êko ts kuşt, he roj fêrî skî min û yekî wî bi dorê diçûn hev, hetani ko fêris ne man, dor min û a wî hat, me ji hev re got: heqê me li ibada tu ne, lazim ez û tu em dakevin hev li meydanê, heger te ez kuştim miletê min hemî ma ji te re, û heger min tu kuşt, miletê te ji mi re ma.

Em daketin hev du, û tef di merik ji min xurtir bû, ko ne tu biwa, wê ez bîkûştama; ev qencik mezin te bi me kiriyê, em bi ruh û malê xwe li ber te ne.

Şer jê r' gelekî dilxweş bû, got: bes e mala te ave, ji mi re bêje, lê îşê vê secadê çawa ye? Mir jê re got: honê secadê deynin erdê, her du li ser rûnîn û xîzeranê xwe lêxinin, kê der dilê we bixwaze we bibe wê derê.

Şer xwatir ji mirê xwest, ser sicadê xwe rûniştin, go: em dixwazim tu me li şkefta Hût deynî; bi hewa xistin secadê, di bin ez mana re birin, nav ewr û stêra re birin, rastî şkeftê hatin, keçikê ismekî sihrê xwend, Hût bû kevir di şkefta xwe de. Daketin şkeftê cem gullî Pembâ, li tenişta xwe danîn ser secadê, çîva xwe lêxistin go: em dixwazim me deynî ba çadira Qemerzeman.

Bi hewa ketin, di bin ez-mên re nabiyena avê û stêra rastî çadira Qemerzeman danîn, nêrin ko Qemerzeman ji qehra re, pir bêhal bûye.

gava çav li wan ket, Qemerzeman kêfa wê pir hat, û jê re got: ya birayê min ê şer, eva din çi ye bi te re?

go: ev ji ya min el

Wê şevê man cem hev du bi dil xweşî razan, her kesî di bin çadîrê xwe.

Sibehê rabûn, li hespê xwe siwar bûn, her kesî jina xwe li pişt xwe siwar kirin, meşyan; ketin çola û xewleciya û meşyan; qonaşa dûr nîzîng kirin, ketin çolekê xewleçî; ava wan xelas bûye, ji tîna behêcfîne.

Şer ji brayê xwe Qemerzeman re got: ya brayê min, çavê xwe li dora xwe bigerîne, hê em tu gunda, şînahîna, em na bînin, em ji tîna helikîn.

Carekî nerîn, devê bîrêkê dîn, çûn ser bîrê, kevîrekê avê-tînê, seh nekirin ko av tê heye an tu nîne; go: lazim yek ji me dakeve bîrê, seh bike.

Qemerzeman ewladê bajara ye, ne wêrî dakeve bîrê; jina şer jê re got: pîrsek mi bi te re heyevan beyna xwe û wî de jê re got:

Tu bi ya mi biki, tu dana, kevîşvê bîrê!

Şer jê re got: çima ez dana-kevîm? Keçikê got: brayê te ewê di vê bîrê de bihêlê; heger tu di binê bîrê de hiştî, t'ê bi çavê xwe bibîni ko mişkek ji tenişta bîrê wê derkeve, beqek ji aliye din ew jî derkeve û wê di ser avê re pêlî hev du ve bîn, derkevin tenişta bîrê, bi cem hev du bisekinin, wê ji te re bêjin: ya şer tu bi qedrê Xwedê kî û mezinehiya wî, t'ê rast bêji kî ji me xweşik e? T'ê bêji mişk xweşik e, sê cara wê vê sualê ji te bikin, her sê cara t'ê bêji mişk xweşik e, heger te wilo got wê mişk te xelas ke, ko heger te go beq xwesik e, wê te tîxin di bin heft tebekeyên erdê, û tu bi ya mi dikî, tu danakevî bîrê.. emê hêdî, hêdî bimeşin..

Şer jê re got: kengê brayê min, min di bîrê de dihêle, hevqas qenci mi pê kiriyê.

Şer çû, şerftek bi xwe ve girêda, Qemerzeman bi şerfê gîrî, daxistin binê bîrê; nerî ko bîr tije ave, ban kir brayê xwe, firaxkî ji mi re daxîne, ji bona ko avê tê de bikişînim.

Firax jê re daxistin, av ji xwe re derxistin, heywanê xwe av dan, wan jî av tîr vexwar, firaxêd xwe tije av kirin.

Şer ban birayê xwe kir go: ka şerfê ji mi re daxîn, ko ez xwe girêdim û mi bikişîne. şerfê jê re daxist, xwe girêda, go: de mi bikişîne.

Li wê derê, fikra Qemerzeman xera bû; ji xwe re got: go ez wîna bikişînim, emê tev de herin cem bavê min, wê ji bavê min re bêje; ev namûs hemî mi kiriyê, ezê pê pis bibim. Lazim ko ez wîna di vê bîrê de bihêlim, ezê ji bavê xwe re bêjim ev tişt hemî mi kiriyê, û jina wîji xwe re bihêlim.

Li wê derê şerfê qetand, brayê xwe di bîrê de hişt.

Jina birayê wîna girîya, ev çi bû te kir, tiştê wîna kesî beta niha ne kiriyê. jê re got: heger tu deyin biki ezê te jî bikujim. jinik tîrsiya, li hespê xwe siwar bûn û meşyan.

Nav beyna wan û bajarê wan sê saet man e. Nêzikî bajêr bûn, çîvanek dîn.

Qemerzeman ban wî şivanî kir û jê ra got: tu şivanê kê derê yî? şîven jê re got; ez çîvanê Emîr Seîd, bajarê zimzîmanê me. Li wê derê kêfa Qemerzeman hat û got: şikir ya rebî, ez bi silametî gîham mala xwe, ji çî-

vên re got: hermişgîniyê ji ha vê min re bibê û bêje Qemerzeman hat, ji xwe re du jin anîne; wê tişteki mezin bide te.

şîven jê re got: tu derewa dikî, Qemerzeman şêra xwari bû. Qemerzeman jê re sund xwar, jê re go: ez îfîm Qemerzeman, çîvan yeqîn kir ko Qemerzeman e, çû cem bavê wî û jê re got: mişgîniya min li te, va lawê te Qemerzeman hat, du keçik ji xwe re anîne.

Hakim ma ecêbmayî. Kêfa wî gelekî hat, ji xewlamê xwe re got: hespekî ji min re hazir bikin.

Hesp jê re anîn, lê siwar bû û çû cem lawê xwe.

Lawê wî bavê xwe dî kêfa wî pir hat, destê bavê xwe maçî kir, jê re got: ya bo va jinê min, di bin çadîrê de ne, were wan bibîne..

Bavê wîna da pêşiya wî, gava ket bin çadîrê û bi çavê xwe gullî Pembâ dî, qidomê wîna şikestin, fitilî ji lawê xwe re got: go hon li vê derê bîv, ezê herime bajêr, esker bi merzîqa pê li we bişînim, ji bona qîmeta we di nav xelkê de çê-bibe. Hakim vegeriya bajêr, pênc nefer esker şandin, ji wan re got, herin Qemerzeman girêdin, ji destê wî û ji lingê wî li ser hespekê bigîrdin, û bînine ye; bîra pîrekên wî li çadîrê xwe bimînin, didu ji we nobeta wan, bikin.

Eskera bi ya wî kir, çûn Qemerzeman anîn li ber bavê wîna danîn.

Bavê wîna şîşek anî, û jê re got: ya Qemerzeman, îsal cend sal ê min ez bi hesreta dîtina gullî Pembâ bûm, sûretê wê li cem min heye, û mi dixwest rojekê hinik ji mi re salixdanê Gullî Pembâ bikin, te bi rehett, te ji mi re anî, kesek li dinyayê tune bû, ko tu ji xwe re bîni; te çû dostika bavê xwe, ji xwe re anî, tiştê wîna kesî ne kiriyê.

Emîr Seîd li meclîsa xwe re got; go hon der heqa lawê min de çi dibêjin.

Meclîsê jê re got, tu zanî, lawê te ye, kuştin û berdan mi-sta te de ye.

Hakim şîqa xwe li bin çavê lawê xwe xist, her du çavê wîna der xistin û xistin berika wî û jê re got: îşelle, sibehê berê ruhnaviyê ezê serê te jêkim.

Wilo girêdayî di Odekê danî, derî lê xelqandin, ew di vî halfê de ma. Emê vegerin ser şer.

Şer binê bîrê de ma, carekê dî mişkek ji tenişta bîrê derket û beqek, ji aliye din derket, di ser avê de, di ber wîna re çûn, tenişta hev du sekinin, û jê re gotin: ya şer, tu bi qedrê Xwedê kî, t'ê ji me re, rastî bêji kî ji me xweşik e?

Şer got: mişk xwesik e. Beqê jê re got: li çavê min binere, û li laşê min binere çiqeyî ez xweşik im; tu bi çi hewayî dibêji mişk ji te xweşikîr e?

Sê cara sewalê kirin, ewîna got: mişk xwesik el

Carekê dît mişk bû xortekî çardesalî, û beq bû qîzek çarde: salî û jê re gotin: mala te ave; te em ji wî halfê xelas kirin.

(ne qediya ye)

Serpêhati

Hakimê Heywanan

Şer, hakimê heywanan temaman bû. Roviyeke xizmetkare wî bû. Rojêkê, rovî jê re go: Şêrê hinermend, Xwedê zane, tucaran, tu bi tu tiştî naê girêdan, û tu naye zêft kirin. Şer go: çawan, ez bi werîsan tême girêdan; şer go: de werîs bîne, min girêde. Rovî werîsek anî, şer pê girêda û derkete derve; ban şer kir go: Waye piling hate tel... Şer, xwe veparimand, werîs qetqetî kir.

Rovî, hate kenîya go: hakimê min, tu henekê xwe bi min dikî, tu dibêji, ez bi werîs tême girêdan; wel, t'ê rastî ji min re bêje, bê tu çewan t'ê zêft kirin;

Şer go: ez bi werîs nayêmin girêdan, lê ez bi duhêlan tême girtin, û zêft kirin; here iyarekî nû bîne, û bîke duhêl û li laşê min bigerîne, û lep û lingên mi bigirîne, tucara, ez nikarim xwe vekim.

Rovî iyarek anî û şer girêda; çû derve go: piling hatî...

Şer xwe li hev qulaptî kir gi xwe veke, wî ew girêdayî biştî û çû. Rovîkî dîn hat, go: çima tu girêdayî?!

Go: Roviyeke hebû, navê wî Îso bû, ez girêdam.

Rovî go: ma tu dixwazî ez te vekim.

Go: belê!..

Rovî, duhêlê li şer gerandî bû, kurisandin û şer vekir.

Şer pirsî: navê te çi ye? Rovî go: navê min Plso ye! Şer go: ez nemnim li wî welatî gi Îso mere girêde û Plso mere berde.

Hirç û Rovî
Carekê ji caran, rehmet li havê guhdêran:

Li gora adête ku dehbîn kovî, li çîyan digerin; rovlk jîr,

bi serê latekê ket û li bin xwe nihêrî; dît ko vaye hirçek, xwe daye beroj û razaye.

Rovî rîpek anî bala xwe, û kevîrek biser hirçê de gindirand.

Hirç bi tirsek mezî ji xew çeng bû û baz da; hinek çû û li piştî xwe mêze kir ko rovlî ye, li ser zinar e, û got: wey, weyl... mamê rovlî tu wî!..

Rovî got: ez benî, min henek bi te kir.

Hirçê got: belê, were mêze ke; ev tîrs û avêtina rîxa reş yarî ye; min jî qebûl e, çîqas tu bê şerm î; û hirçê bera roviyê çûn da.

Di bezdanê de, rovlî di nav du darên teng de derbas bû, hirç jî dikir li pê derbas be; ji ber ko hirç girs e di nav her du daran de ma û rovlî ji par hat û baz da ser hirçê û got: hon hirç, heya di xwe de ne bînin, bawer na kin.

Ibrohîmê Seyda

Mar û Rovî

— Birattî bi rastî —

Carekê mar û rovlî bûbûn destbrakê hev; hatin ber çemekî. Mar go: bira, ez nikarim bi avê xim, mi divê tu min hilgire û min ji avê xelas ke.

Rovî go: were, te hilgirim. Mar avête ser piştî xwe û da nav, heta ko gîha nivê avê. Mêr xwe li stoyê rovlî şîdan, hate bifetise.

Rovî go: bira t'ê çî bikî? Mar go: welle, ezê te bikujim. Rovî go: ka, her du çavê te fî reş maçî bikim û dû re tu min dikujeji!..

Mar xwe li stoyê rovlî sist kir, serê xwe bire ber devê rovlî, devî serê wî kir û kuştî, derxiste ser kendalê çem, û mar li erdê dirêj kir, go: birattî bi rastî.

Tel—Erbî: Emîn Hecî Mehmûd

Fermandarên Mezin

Dû fermandarên mezin hene û heta îro ji wan çetir ne hatine dîtin. Yek ji wan Antîbal e; ji xelkê Kartacayê bû û şerê Romayê kir; ê din Napolyon Bonapart e;

Eurîpa zîttî bû destê xwe, keli bû Qahîre û Moskavayê. Ji xelkê Korsîkayê ye, frensîz e. Siltanê rohelatê ê mezintir Selahedîn e; erdê rohelatî ji êrîştên biyanîyan azad kirin. Selahedîn kurê Kurdistanê ye.

Ronahtî û Deng

— Ronahtî, ji dengî leztir diçe, ji ber wê yekê berî ronîya bruskê lête dîtî û bi dû re guregurê wî lête bihistî.

— Felsefe û mentîq bi destê yewnanîgên kevin hatine danîn; û feylesofên pêşîn ên mezin hemî yewnanî ne.

— Di heqê hikmeta Xwedê da wan gotîye: me seh kir ko em nikarin seh bikin; me dît ko em nikarin bîbtînin.

BALAFIRÊN RÊWINGIYAN

Piştî şerî. 1000 balafirên amerîkanî, ji bona çûn û hatina rêwingîyan hifîrin.

Di van 1000 mekînan de, 36.000 peya bi cih dibin. Balafirî hene ko 20 peya dikarin lê siwar bibin; mekîneyine din hene ko 40 û heta pêncî peyan hildigirin; û ev mekîne hemî ji ûpên adetî ne. Berî sala 1940-î, di rîyen eme rîkanî ên hewayî de 359 balafir dişuxulîn.


Fidakariyê Mezin

Ji destpêka şerî û heta îro, ji lekên amerîkanî, ên bej û av û hewayî 1.036.937 segman û serbendî ji qîwet ketine, lêde 239.533 kuştî, 628.353 brîndar, 49.590 windabûyî hene; ên mayîni ketine destê dîymîna û bûne hêsir.

Di şerî Okinawayê de 8.252 segman û serbendî amerîkanî hatine brîndar kirin û 1.781 heb ji wînda bûne, kes nizane li kû ne.

Xesarên japonî lêde 117.046 kuştî û 10.578 hêsir in.

MIRÊKA CIHANÊ



Ji îbadetgehên Norwîçe der erdê Norfok.

Awahî û îbadetgehên ko di wê awayî de ne, ji texlîtê gotîk in. Awayê gotîkî ji îl-de-Fransê derketîye, angî ji axa Frensê. Di sedsala 12 û heta 16-an de awahîyên gotîk gelek rewnaq da bûn Eurîpayê.



Xwendegah û zanîngeh ev in du stûnên miletekî ê xurtî û qaim. Bergeheke Çetengî ji ya Zanîngeha Oksfordê.



Keçebaw sooyetî bi palayîgê mijûl in.

Çap û Nivîsar

KITÊBÊN NÛ

Di vê dawiyê de, ser Kurd û Kurdistanê sê kitêbên nû hatine belav kirin û her sê ji bi zimanê erebî ne. Nivîsevanên di van Jostê heq û rastiyê ne; bi awakî xweş û bê meyildarî kitêbên pîrsa nijadê me xistine pêş çavên xwendevanan.

Ev in nav û nîşanên van: Kurd di Sûriye û Libnanê de. Bi qelesa nivîsevanê heja û dîktorê felsefe û zanînan civakî Dr. Edîb Mihewed.

58 rûpelên ve kitêbê hene. bihayê wê 100 qirûşên libnanî ye, heq ko ve kitêbê dixwazin peyda bikin: nav nîşanê nivîsevan ev'e: Milk Debis; Tarîq Abdîl basit-El- Faxûrî. Bêrût-Libnan.

Kurdistan an Welatê Kur-

dan. Bi qelesa nivîsevanê qîmetdar xwediyê rojnama Atra, Mîrza Yûsif Malik. 44 rûpelên ve kitêbê hene. Bi hayê wê 100 qirûşên libnanî ye. Peyda kirina wê bi destê nivîsevanî çêdibe.

Navnîşanê wî:
Mîrza yûsif Malik—Sandûq El-Berîd 857; Bêrût-Libnan.

Pîrsa Kurdistanê

Di nav bîra duhî û fro de. Bi qelesa nivîsevanê guzde û dîktorê felsefe û zanînan civakî. Dr. Edîb Mihewed. 46 rûpelên ve kitêbê hene; bihayê wê 100 qirûşên libnanî ye.

Navnîşanê nivîsevanî:
Mîrza Dr. Edîb Mihewed;
Milk Debis; Tarîq Abdîl-basit-El-Faxûrî; Bêrût-Libnan.

Roja Azahiyê

—çarê tîrmehê, Sala 1776—

çarê tîrmehê sersala roja azahiya Emerikayê ye; di vê rojê de, li sala 1776-an Emerika giha serbestî û serxwebûnê û zencîrên bindestiyê şêkandin.

Vê rojê mîletê amerîkanî bangnek belav kiriye; têde gotinên jêrin ên ronak û giranbîha hene: hemî mirov mîna hev û du ne, û aza û serbest in, û hin heqên wan ên bîngêhî hene ko ne dikarin bêne dayn û ne ji standin. Mirov, ji hêla heq û kevne-dariyê mîna hev in; ne kêmi hev û du ne.

Heqê her kesî ye ko ji bona xweşî

û kamiraniya xwe bixebite; hero b zanin û ma'rifetê bigehe halekî çêtir.

Ronahî, zanîn, pêşveçûn, xwendegah û zanîngêh, azahî, serbestî biserxwebûn, bext û namûs, vên û xebat, qelsxistin, û kambaxiya zorkerî; ev in armanca mirovan; ev in armancên ko ji bona selametî û pişt xurtiya wan, di nav 30 salan de Emerikayê du caran şerê zalim û zorkeran kiriye.

Qencî, xweşî, rahetî û dewlemen diya hemî fûsan; azahî û serbestiya hemî mîletan: eve Armanca Ci hanê; Armanca hemî nijadên dinyayê; çi biçûk, çi mezin; çi reş, çi spî; çi zer, çi gewir.

ME BIHISTIYÊ

— Heta niha 350.000 eskerên amerîkanî ji Ewropayê xwe hilanîne û herê xwe dane welatê xwe.

— Hikûmeta elemanî zêrên xwe di bin erdê de veşartî bû; leşkerên Hevalbendan, piştî ko erdê germanîstanê vegirtin, ev zêr, heke ne bi timamî, kom pey komekê peyda kirin. Di vê dawiyê de, ji nû ve 4.500 kilo zêrên elemanî, ketine destê amerîkaniyan.

— Tîrs dijîninê mezinahiyê ye. Ji Xwedê pê ve ji tu kesî metirsîn.

Ko tîrs ket dilê ve, bidin eqelê xwe, ko ji mirinê xirabtir tiştêkî nikare bigihne we. Ma mirin tiştêkî xirab e. Tiştê ko emrê Xwedê ye, ne xirab e.

Ji xwe mirin her heye.

Pêxemberên Xwedê ji jê xelas ne bûne. Zû an dere- ng, emê rojekê ve badîne vexwin.

Pêşiya tu kesî de, xwe pîs û piçûk me kin; bînin bîra xwe ko hon kurd in.

Kurd bi mîranî û mîrxasiya xwe nav û deng dane.

Ji xwe pêxemberê me

— rehmêt û silava Xwedê lê bit — du tişt di cîbandinî: mîrxasî û comerdî.

Dibêjin can şîrîn e; tiştên jorin bîne bîra xwe, tu seh bikî ko navekî pak û mezin, ji can şîrîntir e; Can diçe, mirov dimire, mal vînda dibe; lê navekî mezin her û her dimîne.

Gava ez bi xelîqê xwe xebir didim û ew seh dikin ko ez kurd im; ji kêcan aliyê dinyayê be, peyayê ko bi min re daxê ve, hema dibêje:

Ol em dizanin kurd çavsor û mîrxas in.

Hindik axaftin, lê kirin, ziravî û nezaket, lê dilekî pola; bê zîrt û fort; mîranî û mîrxasî; comerdî û kubarî.

— Mihendîzekî rûsî balafireke nû çêkiriye ya ko di sa- etkê de 800 kilomêtran diçe. Bi wê balafirê, rêwîngî di nav heft saat û nîvan de, dikarin ji Parîsê herin Nû-Yorkê.

— Zanayên rûsî isûlek peyda kirine û pê mirovê ko bi derba elektrîkê miriye, ji nû ve sax dikin.

— Di erdê Polonyayê de, 3.500.000 cuhî hebûn; elemana ew kuştine; niho di erdê polonî de bi tenê 100.00 cuhî mane.

— Dîktorekî inglîzî dermanek peyda kiriye yê ko ji silfetoyê çêtir û xurtir e.

PÊJINÊN DINYAYÊ

Xebat - Fidakari - Serfirazi - Serdesdî



Jinên cihanê ên çeleng û dewlemand, gava ciline nû dixwazin, li Parîsê dinêrin. Rob û qeftan, guhar û gustîlk, gerdênî û sol û serpûşên spehîtir, jê derdikevin.

XURTIYA XEBATÊ

— Par, karxaneyên amerîkanî 30.889 gemî, 17.565 tang, 595.330 kamyonên eskerî, 824 topên giran 7.454 topên sivik, 152.000 agir û guleavêj, 1.146.774 ton cebîlkaniyên topan û 753.000 ton kewçûkên sentetî çêkirine; angû bi awayê kimeyewî.

— Karxaneyên frensî Otomobileke nû çêkirine ya ko sed kilomêtran de, bitenê 4 litir banzin dişewitîne.

— Wezereta amerîkanî a şerî dide zanîn ko karxaneyên amerîkanî bi çêkirina balafira cihanê a mezintir mijûl in. Ev mekîne 61 mêtir dirêj e, 6 motorên di wê hene û dikare 10.000 mêtir dilind bikeve.

Ji bona balafireke hinde mezin, bi hewa re 10.000 mêtir bilind ketin, tiştêkî nedîtî ye. Di wê balafirê de 204 peya bi cih dibin.